ADÎL DURAN

(HER ROJ BI BÛYEREKE AVÎS E)

# DÊRSÎM

## DESTAN

( Bi Pêşgotina Mehmed UZUN )



*Weşanên Çanda Nûjen*

www.netewe.com

**ADİL DURAN**

( HER ROJ Bİ BUYEREKÊ AVİS E)

# DÉRSİM

## DESTAN

www.netewe.com

Adîl DURAN

(Her Roj Bi Bûyereke Avîs e)

# DÊRSÎM

DESTAN

Weşanên Çanda Nûjen - No : 9
(Modern Kultur Förlaget)

Navnîşana Xwestinê
Tensta Alle 43/2tr.
16364 Spånga
Stockholm/Sweden

Çapa Yekem : Stockholm –1996

Çap : Baran Tryckeri

ISBN = 91-972247-4 - X

www.netewe.com

# GOTÎNÉN JANÉ

Dêrsim; derîyê sîmîn ê dilê welatê Kurdan, derîyê zêrîn û kahnîyên jîyana kurdî. Dêrsim; bihuşteke rastîn a cîhanê, yek ji navçeyên rengîntirin ê welatê kurdan. Dêrsim; adet û ûsilên kevintirîn ên însanîyetê, cîhaneke taybetî ya cî - hanê. Warê şêr û pilingan, seyîd û dedeyan. Cihê mêrxas û egîdan, jin û keçên bedew. Dêrsim; jîr, serbilind, maxrûr. Dêrsim; brîndar, stûxwar, bindest. Dêrsim; serbilindahîyeke yekta, keser û xemgînîyeke bêpayan.
Dêrsim; kahniya jînê, kahniya janê
Dêrsim; guleke sor, kulekî sor
Kî dikare Dêrsimê ji bîr bike? Kî dikare tarixa Dêrsimê ya bi xwìn avdayî gorî tarîxê bike? Ew kesê kû dixwaze vê yekê bike, xwe dixapîne. Tarîxa Dêrsimê hê ne bûye tarîx. Tarîxa Dêrsimê jîyan e, nan û ava rojane ya welatê kurdan e Dêrsim, serhildana Dêrsimê, bi dû serhildan û berxwe - danê re, qetliama mezin a Dêrsimê hê nêbûye do. Ew îro ye, stêrka Gelavêjê ya şevên tarî û kaserkûr yên welatê kurdan e.
Piştî serhildan û berxwedana Dêrsimê, 1936-38, gava bi deh hezaran kurdên Dêrsimê hatin kuştin û bi deh heza - ran jî hatin surgun kirin, desthilatên nû yên Tirkîyê sim - bêlên xwe badan û gotin; "Me Dêrsim kola û ew gorî axê kir..." Lê wan xwe dixapandin. Rast e, Dêrsimê, bûka na - zenîn a Rojhelatê, reşa xwe girêda û li şînê rûnişt, zimanê xwe jêkir, bê lal û bêdeng hêstîr barandin. Ev hemû rast in. Lê Dêrsim nebû gor û goristan, nebû welatê lal û koran, nebû axeke stewr, nêbû daristana mirî ya bûm û kundan. Di bin perda reş û şinê de , Dêrsim bû destanek û mal bi mal, war bi war geriya, ji nifşekî veguhezî nifşekî nû.



www.netewe.com

Av, kahnî û lehîyên zelal ên Dêrsimê, dîsan bi xûşeşûş, heri - kîn, kulîlk û gul, dar û dol, dîsan, di her destpêka biharê de, serî hildan, bi rengên taybetî yên Dêrsimê, hêşîn bûn. Gelî û newal dîsan bûn warê şêr û pilingan, dehl û şikeft dîsan bi hilma evîndaran tijî bûn. Heyam zan, jin û diyên Dêrsimê welidîn. Zarokên nû, keç û nevîyên dêrsimîyên qirkirî, sirgûnkirî, hatin dinê. Dinya ji nû ve geş bû, şen bû. Dengê zarokan, dîsan bi esmanan gîhan. Dengê zarokên heyamên nû, dîsan, bi dengê çemê Munzurê, teyr û tûrên Dêrsimê re bû yek.
Iro, bi qasî 50 salan bi dû serhildan, berxwedan û qetliya - ma Dêrsimê re, zarokên Dêrsimê rahijtine pênûsê û ser - pêhatîyên Dêrsima kahnîya jîyanê, kehnîya janê, diniwîsin. Zarok û neviyên serekên Dêrsimê Seyid Riza, Elişêr, Hesen Heyri, Nurî Dêrsimî û yên din, îro bi gotinên xwe yên mîna lûlû, hal û hewalên Dêrsimê tînin ziman û salix didin. Kemal Burkay, Mustafa Düzgün, Haydar Işik, Riza Çolpan û lawên din yên Dêrsimê bi berhem û eserên xwe, Dêrsima kû desthilatan bawer dikir kû êdê ji bîr bûye, ji nû ve derdixin ronahîyê. Sitran û destana kû di bin perda reş a şinê dê dihate gotin, direşinin ser kaxizên spî şahidî li tarixa bi xwîn dikin û wê tarixê bi me digihînin. Ew tarîxa Dêrsimê hem ji bîrbûnê hem ji tarîx bûnê rizgar dikin û wê dikin beşekî jîndar û jîyana îro ya kurdan.
Niha navekî nû li wan law û keçên Dêrsimê yên gotinbêj zêde dibe :Adil Duran,
Ji Dêrsimê ye. Mîna law û keçên din yên navçê, ew jî bi stran, destan, gotin û çîrokên Dêrsimê mezin bûyê. Bav û bapîrên wî ew û heş û mejîyê wî bi serbûrî û tarixa Dêrsimê risandine. Niha, gava bîr û hizrên wî, heş û mejîyê wî hatiye radeya vegotina gotinên janê yên Dêrsimê, veguhezandine tecrube û janên bav û kalan, wî jî, mîna bira û xwişkên xwe yên din, rahiştiye pênûsê û destana Dêrsimê nivisiye.



www.netewe.com

Û wî ev xebat bi gotinên bav û kalan kû li Turkiyê mîna berfa ber tavê dihelin, aniye pê. Bêgûman bi hezar zehmetî, bi hezar keft û leftî. Tevî ku wî hîç kurdî nenivisiye Adil Duran bi gotinên kurdî ku her yek nimûna jan û ke - serê ne, jana Dêrsimê hunandiye û destana xwe, tevî kê - maniya tecruba nivisîna kurdî, bi kurdî anîye pê, bêyî ku hunera edebî û estetîka lihevnînê ji bîr bike.
Ma her destpêka pir zehmet a nivisîna kurdî ne weha ye? Ma ji xebateke pir zehmet pê ve, janên keşiyayî dê çawan bi gotinên jantijî biafirin?
Min bi heyecan "Destana Dêrsimê" ya Adil Duran xwend. Mina her cara ku ez berhemeke law û keçeke Dêrsimê dixwînim, îcar jî dîsan, gava min ev destan xwend, Nurî Dêrsimî, kitaba wî û serpêhatiye min û kitaba wî hatê bîra min. Eger ez ne şaş bim, destpêka salên 1970- an bû. Rojekê hevalekî min, bi dizîka, behsa "kitabeke pir mûhîm" kir. Dotira rojê jî, wî kitab anî û bi dizîka da min. Kitab, "Kürdistan Tarihinde Dersim" a Dr. Vet. Nurî Dêrsimî bû. Min kitab wergirt û berê xwe da malê. Havîn bû, germê leylan dida. Bi xwêdan, bi heyecan min xwe gîhand malê û dest pê kir rûpelên kitabê, yek bi yek vekirin. Û heta ku min kitab xelas nekir, ez ji malê derneketim. Her gotineke kitabê dilopeke xwìdan bû, dilopeke hêstir bû, dilopeke jan û kozeke agir bû...Di dawiya kitabê de, nivîskar bi navê "Gençliğê Hitab" paşgotinek nivîsîbû û kitaba xwe yadîgarê keç û lawên kurdan dikir. Û Nurî Dêrsimî ku kitaba xwe li welateki dûr nivisi bû hêvi dikir ku law û keçên kurd Dêrsimê ji bîr nekin...
Adil Duran jî, bi vê destana xwe, mî na xwìşk û birayên xwe yên din, li şîretên Nurî Dêrsimî guhdarî dike û dide ser riya jan û keser, lê di eynî wextê de, xîret û rumetê. Ew jî tevî kerwana şevê, lê di eynî wextê de, ya serbilinda - hiyê ku stêrka Gelavêjê rê şanî dide, dibe...



www.netewe.com

Di dawîya destana xwe de, Adil Duran weha dibêje; "Di bihar de mirin / Zor e gula min / Em çawa bi hêsanî herin û / Min ji êşên dilê xwe li stranan bar kirin..."
Kesên ku bawer bûn ku wan di biharê dê Dêrsim kuştibûn, xwe dixapandin. Ma Dêrsim, kahniya jîn û janê, diya le - heng u şerwan, nivîskar û şahîran, di biharê de dimire?
Dêrsim; kahniya jînê, kahniya janê...

**MEHMET UZUN**



www.netewe.com

**Dewsa Pêşgotinê de**

Em ji ku ve tên
Û bi ku ve diçin!
Ma tu kesekî ku bizanibe heye?
Mirov carna çêker e
Carna jî ruxên e
Bi çêkerî û ruxên jî
Mirov nemir e
Ew dibe ramanek ji min re..
Ew tahlî û tûjî
Min ji sitranan
Ji bav û kalan
Berhev kir
Bi lêger û lêkolînan
Ne wisa bi hêsanî
Pêk hat bûyerên vê destanê..
Ez hatim girtin
Hatim lêdan
Hatim xeberdan
Zanim çi wext bû
Dijmin bêbext bû
Bes! xuyaye ku
Adet û toreyên gelê me ye
Çaxa stran tên gotin
Hêstir ji çavan tên xwar, dil bi sotin
Êş û jana Dêrsimê xilas nabe tenê bi gotin
Koçgirî - Agirî - Barzan û Helepçe
Ew çîrokên jîyandar û roj dîtin
Ew hêstirên çavan ku
Heta iro tiştek li ser wan ne hatîye gotin
Ez yek ji ewan
Naxwazim bijim wek heywan
Bi sond û peyman



www.netewe.com

Bi xeyal û raman
Ez ê binivîsînim
Û ne nivîsandinê çêtir
Ewa ax! û peyman...

**Adil Duran**
**(Girtîgeha Niğde)**





www.netewe.com

(Em mîna tiliyên destan
bi hev re girêdayı ne..
Tilîk jan bide, êdî ew jan
dikeve dilê me hemûyan..)

Bi alîkariya hogir û dostan
Wisa dest pê dike ev destan
Ger têkoşîna we bi rûmet be
Ko,
Jîyeneke nûjen di Kurdistanê de qîmet be
Têkoşinên ku,
Berê wê hatine dayînê ji rûmet in
Ihsan Nurî Paşa
Qazî Mihemed
Şêx Seîd
Seyîd Rizo
Û Mistefa Barzanî ji
Qedr û qîmet in..

**BÛYERA HESEN HAYRİ**

Hesen tevgerê xwe hissî dikir
Dilnermik bû, zû bawer dikir
Fermana xwe da bi dilmermiya xwe
Bendê xwe kişand bi destê xwe
Gelek Hesen dijîn îro ji niha
Jiyana ewan bêrumet e
Û mirina ewan jî bêbiha
Lê çiqas bêberketin mirina mirovan
Mirina Hesen jî qasî ewan
Mixabin;
"Tu serê vala hilde,
ne hilde, çi feyde.."
Çîya teqiya
Pêt û agir bilind bû
Heya li banî çû...



www.netewe.com

Mebusê Dêrsimê, Hesen Hayrî
Carê Ketibû bin zornîrê..
28. Çileyapêşîn 1926 çû berdarê..
Kurê wî bo ku, meyitê vî hilîne
Ji hukumetê xwest bi alenî
Hukumetê fermana wî jî deranî
dibêjin;
"çûk laceyî bû li devî.."
Kurê Hesen jî revî
Xwe spart çîya yên Dêrsimê
Di navçeyi Dêrsimê de
Gelek piştmêr civandin hev
Leşkerên Romî ve şer kir
Çend roj û şev
Ew esîr kirin tev
Bona ku ibret bin ew
Daleqandin deh leşker rex hev
Ji ewan yek sax rêkir Xarpêt ê
Sedem bûyerên ku pêkhatiye here bibê..

* * * * * *

Başurê Dêrsimê bi ava Pêr e
Rojhilata Dêrsimê bi ava Muradê
Rojava û bakurê Dêrsimê bi ava reş û Feradê
Lê pêçaye xwe li havirdor mîna giravê
Û cîyê ku çiya xelas dibin.
Tixûb heta wê derê ye bê miradê...

* * * * * *

25 Adar 1935
Bi mercên 2884 an
Qanûna Dêrsimê derxistin
Mirov hatin kuncîn û tev hatin kuştin
Êdî ferman li defê xistin
Îsê ker - î axmax



www.netewe.com

Fewzî Çaqmax
Mistê kor
Bi leşkerên ser û jor
Û Akdoğan
Kavil kirin yek
Ji êl û eşîran hinek
Xwedî kirin bi qelî û hêk..

1937 Adar bîst û yek
Êlê Demenan û Heyderan
Soz û peymanê xwe kirin yek
Û li ser çemê Harçik
Pirek herifandin
Têlên telefonê qetandin.

26 Adar
Leşkerên pîsî mirdar
Tijî bûn her der
Dest dirêjî kirin, dest avêtin
Bûn gemaro li hawirdor
Asê û dijraber bûn şêrên Dêrsimê
Avêtin li ser qereqolê Sînê qor bi qor

* * * * * *
Dem dema rojîya 12 îmaman bû
Mixabin carê stêra ewan rijîya ku,
Bêbext û bextkawil Romî bû
Zor û zilme xwe li gundan hişt û çû

* * * * * *
Daxwaz ew e
Azadî
Biratî
Û aşitî
Bila dil;
Bi hesret



www.netewe.com

Bê hêvî
Bê evîn
Û xemgin nebe
Kurdistan ê çêbe
Dinya xira nabe...
Çi xweş gotineke kek Îdrîs heye
Dibê "Yên ku qibleyê wan Kabe ye
Ji zilmê wan pirs lêkirin nayê"
Ew romiyên xirab
Xwînrêjên rêbir
Gelek soz û peyman dan
Li ser soz peymanekê de man
Gotibûn "Em ê we tev bikujin"
Û em kuştin
Durûtiyê û fêl û fêndan
"Awirê ewan wekî çerm e
Ne fedi dikin
Ne jî dizanin çi şerm e"
Yên ku naxwazin tê bigehên
Xwe pêşve xinin
Xwe derbaz bin
Û yên ku bona azadiya xwe şer nekin
Pêwiste şerm bikin.
Ew in ew ketî
Ew in ew hatine êxistî
Mixabin
Çawa zaroyên Zerdeşt bên êxistin
Nesilî û şelande yekî ronahîyê ye
Pêçok e Zerdeşt...

* * * * * *

Ax! ez zarokwarî
Zarok bi girî
Di wan rojên biharê de
Şeva borî



www.netewe.com





www.netewe.com

"Min dil da evîndarê
Şa nebûm li yarê
Zarokek bi çavên morî
Go û li awirên min nêrî
"Yabo ! xwezî
Isal ez biçûma nowê berx û karan
Keşke bi ewan re bileyîstima
Li ser şepal û boran
An jî di şevên tarî û dirêj de
Te jî, ji min re bixwendana
Aşiq xerib û Memê Alan
Ma, çi bû ji me?
Çi hat serê me?
Em ketin van halan...
Ax ! ez zarokwarî
Zarok bi girî
Me xwe spart
Û em veşartin
şikeftên bê derî...

**Bûyerên Xidî mamê Îsê û bapîrê min Elî Hecî**

Xidî mamê Isê
Li girê şavan
Apê me yê neheqiyê bû
Li ber duwaran
Bêkesî û belengaziyê çû...
Di sala 1914 an de
Tev kuştina Filehan de
Apê Xid du salî ye
Kurê Isê
Û ji dayikeke fileh bûye
Ewqas dizanim ku Xid kî ye



www.netewe.com

Pê diêşim ew tufana ku bi serê wan ve hatiye
" Hemu malbat
Pez û dewar
Tev tê kuştin
Mal talan
Gund wêran dibe..."

Bapîrê min ji leşkerîyê fîrar e
Digot " Dema ku berfa sor dibariya
Ango şerê Uris û Osmanîya de..."
Xwe we şartî, peya û bi gavan
Tî û birçî bi revê mehan
Heya ku tê li girê şavan
Dinêre ku
Her der xopan e
Pez û dewar
Jin û mêr
Tev hatine kuştin
Bi guleyên topan
Tizbîhekî lûl dibîne
Ji destê meyitekî kal distîne
Zarokekî jîyîn dibîne
Hembêz dike bi xwe re tîne
Navê wî Xidir datîne...

Dema ku ez bi apê Xidir re
Axafti bûbûm hê rîspî
Û li ser pîyan bû
Min got wî
"Ma tu di serhildana Dêrsimê de
çend salî bûyì ? "
Ez bîst û pênç salî bûm
Baş tê bîra min
Dema bênderan bû
Min bi pişt gûnî dikişand



www.netewe.com





www.netewe.com

Na, xêr !
Ez li newala zizaqê bûm
Û çi bibînim !
Ew ê hin tiştên ecêp hilkişin
Ji darê Lîlik û gûjikan, gelek balkêş in
Min xwe bi xwe re got
" Ew hirç in çi ne ? "
Dûre ez bêdeng nêzî wan bûm
Min lê nêri ku
Ew in, ew leşker in
Wê demê xeyalê dê û bavê min
Hat û çu ber bi çavên min
Min çend êstir ji dil barand
Û bi lez şunde hatim gund
Çûm ba apê Elî
Min hal û mecal got wî
Apê Elî ango bapîrê te
Kalekî patî bû
Gelek rê û çalakî dîtîbû
Kûr bi kûr raman kir
Û gote min
" Xidê min
ma wan xinzîran tu dîti ? "
- Na mamo !
Û dom dikir
" Teşqele meke
Ez ê herim ba Dilo Begê
Tu jî zû here cem Keko û Memê
Çêtir e, hemû piştmêran bicivînin vê demê..."



* * * * * *

Di wê rojê piştî nîvro
Mem û Keko û çend
Piştmêrên ewan pêxas
Amoja Por, Zêt, Xec û Fat



www.netewe.com





www.netewe.com

Hinek kes ji gundên din hatin
Apê Elî û Fatê jina wî
Dilo Beg bi hev re
Kirin yek şirove
Çûn ba leşkeran...
Em jî yên ku li nav gund man
Me xwe kar kir, amade bûn temam
Kokim, zaro, jin û nexweş
Tevî xwarin vexwarina wan
Girt bir cî kir li nav zinar û baxiran
Ew kevir vekolanên Filehan
Me jê ra digot " odê gawiran "
Xort, jin mêr tev man derveyî malan
Em ketin kontarê kort û çalan

* * * * * *

Berî êvarê
Bi hustîxwar
Şûnde hatin
Bi kêrê vekolanê, dil bi sotin
Ji devê wan dernediket tu gotin
Dilo Begê li Apê Elî nêrî
Apê Elî bersîv da bi serî
Dû re go û got
" Ew hirç çaqal û keftar in
Segên Romiyê xwûnxwar in
Mirovên wehş dîn û har in
Me xwesteka ewan pirs kir
Awirên ewan dit ku ne dost û yar in
Ewin ew dupişk,koremar û neyar in"
Keko yê mala Qepan
Hêrs bû û axaft bi lepan
Go " Emê bi ser wan de herin "
Dilo Begê got " na merin



www.netewe.com


Emê haziriya xwe bikin
Bi şev dema xewê bikevin nav
Bi agir, bi xişt û pîjikên zirav "
Wê şevê nivşev
Jin-mêr yek bûn tev
Hawirdor li wan girtin
Keko û Apê Elî
Bi xişt û pîjikên zirav
Daketin newala Zizaqê
Nobetdarên ewan bê taqet hiştin
Û çek û rextên ewan rahiştin
Durre bi agir
Qêrîn û hawar
Dar û ber
Çûn li ser
Neyarên ker
Ewan çek û haçetên xwe
Cil û corên xwe
Cî hiştîn bi qêrîn û revê
Ketin nav tarîya şevê
Winda bûn...

## AMOJA POR Û BÛYERA PEPÛK Ê

Ew dem çi dem bû
Li ku derê bû
Çawa bûbû
Ma, kê dîtîbû
Ez nizanim.
Xêr û guneh di stuyê wê
Ew serborî tê gotin hê...
"Keko û xwişka xwe
Di rojeke biharê
Derin çinina kelengan
Dibetilin heya êvarê



www.netewe.com





www.netewe.com

Herdu rûdinin tenişta zinarê
Bi hevre parve dikin
Kelengekî li wê derê
Paşê turikê xwe
Hildidin milê xwe
Derdikevin ser rê
Turik kun e
Tê de diweşin hemû keleng
Heya ku digihin malê
Dem dibe gelek dereng
Û turik vala dikin ku
Nemaye tê de hebek keleng
Keko ji wê pirsî bi gef û dilekî teng
Li ser agir û tavê sond dixwe
Ew keçika spehî û çeleng
Dibê:
"Te xwar, xilas kir hemu kereng"
Keçik feqîr û bêçare
"Zikê min biqelêşe" dibê ji wî re
"Û lê binêre..."
Keko çav tarî û bê hiş
Zik de dike xar kêrê
Û lê dinêrî
Tê de ye ew kelengê ku
Li hev kirine par
Wê demê êşek dikeve dilê wî
Tê de lîf dide wekî mar
Keko bi hawar
Bi qêrîneke dîn û har
Dibê "Ya xwedê hawar"
"Min bike çukekî wisan ku
Ezê bigerim dîyar û diyar
Vê êşa dilê xwe bikim hawar
Li ser dar û ber
Zinar û lat û yar"



www.netewe.com





www.netewe.com

Riwayet dibe ku
Bi vê bergerînê
Keko dibe pepûk
Ew roj wa roj e
Her demê biharê
Ku kelengên taze tê ristinê
Pepukê mendebûr
Bi dengekî tehl û tûj
Pê şanîdanê meramê dilê xwe dike
Û wisa bang dike;
"Pepuk, pepuk !
Kê kuşt, min kûşt
Kê şuşt, min şuşt
Kê helanî min helanî..."

* * * * * *

Di sala 1937 an de
Eşira îzolî
Bi nezanîn mil dan
Bê çare û bi şerm serî hildan
Û ketin navşerekî germ û giran
* * * * * *
Qeynî sêwî û bêkesan
Dixwazim bibêjim
Navê hinek mêrxasan
Keko yê mala Qepan
Memê birayê wî
Piştre xwarziyê wan
Kurê Elî Hecî, Memê Reş
Keko dikeve destê dijmin
Li Xarpêtê tê daleqandin
Mem direve bajarê Edenê
Çend salan bi zordarî
Bandoriyek didomîne
Xwarziyê wan Memê Reş
Li diji axa û bega serî hildide



www.netewe.com





www.netewe.com

Mixtarê Rîçikê Dilo
Welatparêzekî xîret e
Ew tên bîranîn
Ew tên zanîn

* * * * * *

Yadê çav bi girî
Destên xwe li hewa vekir
Dest bi hewara dilê xwe kir
Go û got
"Ya ! Dizgun, ya Kurêş
Ya rebê li ser kelek û gemiyan
Tu mîhrîvan î
Ya Elîyê dilovan
Ma tu me nabînî
Em tî birçî û tazî ne
Ji me re ne xem û kul e
Em bindest in
Bêxwedî ne
Bêkes in li ber dîwaran
Bawermendê herî delal ya Xwedê ne
Ma ev çi hal e em tê de ne
Îro perçek ji can û rihê min çû
Qîza min şêr û şirîn bû
Dest hinekirî
Mîna gula vekirî bû...

* * * * * *

Keko rastî dadê hatibû
Dîtîbû ku
Xanga wî ya delal
Dirêj bûye li nav xwina zelal



www.netewe.com





www.netewe.com

Keko kor. ker û lal
Dest û pîyên wî leriziya
Dev û rûyê wi zer bû
Bi axîneke xiske, xisk
Sitranek ji dilê wî der bû
Got û got
"herê lê kewê
Kewa min î gozelê
Rind î delal î
Tu çima naxwînî
Kûr dinalî ji wî dilî
Xwina te ya sor e
Mina wê gul ê
Tu bêmirad î bilbil î
Ez ji te re bûme pepûk
Dadê bê per û bask
Li dor te tê û dere wek Hulî "

* * * * * *

Wan rojan
Zordestî - bênamusî
Neheqî - bêbextî
Kuştin û talan
Dijwar bûbû...

* * * * * *

Keko ji rojan rojekê
Pênc leşker
Di nav avê
Germikê Baxxwînê de girt
Tifing rast girt
Û jê pirs kird



www.netewe.com





www.netewe.com

"Heywan lawên heywan
Niha di destê min de ye dewran
Ka bibêjin ji we kê kuşt ewa heyran"
Leşkerekî bersiv da
"Lo dînê har
Ma, kîjan qîz e ewa heyran ?"
Şirqînek ji tifingê hat
Şirqîneke din
Şirqînek li pêy hev
Nema xilasbûn û rev
Ava germikê baxxwînê
Bû gola xwinê...

* * * * * *

Tê gotin
Paşê Keko
Nêzikî bîst piştmêr civandin hev
Şevekê avêtin ser qereqolekê tev
Yek jîndarek sax nehiştin
Hinek mikurvan û axa jî kuştin
Malê wan talan kirin
Û yên tunebîre birin

* * * * * *

Li ser çiyayên Munzur
Di şikeftekê de
Jineke porspî
Kevir û kuç civandin hev
Ji bo şerkerên nemir
Miqabilî girgirê - tanq û topê
Di dest te kevir şer dikir wê şopê
Êdi bûbû banga sibê
Ma, tu nabê,
Hawirdor li ewan tê girtin



www.netewe.com





www.netewe.com

Û ew bûyer wisa tê gotin
"Nabe teslîmiyet
Nabe xwe firotin
Ma, yên ku dixwazin teslim bin
Xwe bi erzanî bifiroş in hene ?"
Du qîzên dehûdu salî
Tirsîyan û gotin bi serî badanê
" Dadê qurban em xwe ranagirin lêdanê
Bona ku nekevin ber lepên dijmin
Destê wan girt, heya latê zinaran anî
Bi hevre gotin;
"Va dar e
Va kevir e
Bibe şahidê me
Û ewe gotarê me
Bimre Romî yî bextkavil
Her bijî Kurdistan...œ"
Destên hev girtin
Xwe berjêr avêtin...

* * * * * *

Dêrsim ket
Ezman mij û duman
Bi qêrîn, hawar û eman
Derdekî giran
Li ser derdan û bê derman
Dêrsim ket !
Dar û daristan
Bax û bostan
Gul û gulîstan şewitî
Jindarek ji nav de nefilitî



www.netewe.com

* * * * * *

Bi awayekî din
Hawirdorê mala dilo girtin
Dilo berxwe da
Laşê çend xwinmêjan danî erdê
Guleyên wî xilas bûn, neman
Bi xençerê jina xwe kuşt û can da
Dijmin zora wî bir
Mala vî talan kir
Û agir berda
Di wê nişkê de
Qîza dilo ya heşt salî
Hilkişiya çû ser xanî
Destên xwe rakir li banî
Di navîna xwe da axînek anî
Go û got:
"Wey li min dayê
Wey li min bavo !"
Bala serleşker kişand
Wi werîsek vij xist şand
Û gote wê
"Ka vî werisî pêbigre
Emê te ya ji nav agir derxînin"
Qîzik di nav agir de kizirî û hat sotin
Ji ber wahş û hovîtiya leşkeran
Wê bi pîrozî xwe da agirê har
Û ewa pêhati wî serleşkerî re
Bû guneheki tuj î bar
Dilê wî hinavê wî xwar
Û da ber serê xwe çardexwar
Ji xwe bi xwe re got
"Em hov in ,ne xweş mirovin
Ku eva ji bo felatiya xwa
Nehat û da ber agir canê xwe..."



www.netewe.com





www.netewe.com

* * * * * *

Keko li ser çokan ket û
Runişt kêleka avê
Herdu çavên xwe kuta neynika navê
Raman kir û
Ber bi çavên vî de hat û çû
Xeyalên dê û bavê
Ne dizanîbû, kî ma, kî mir
Dev bi sitrana xwe kir
"Dêrsim di navberê çar çiyan
Hate qelandin kizirî hemû jiyan
Mirov bi hesret û bi evîn nebiya
Bila tî, birçî û tazî bişewitiya

Rêya ava Munzur xwînî û kûr e
Rêya Amed girtiye û dûr e
Dost kêm in dijmin har e
Hawar ! ware,bira Rizo ware!

Îro Dêrsim ket ruhê min çû
Dest hinekirî mina bûkekê bû..."
Ev sitran nîvçe ye
Nizanim çi wext bû
Tê gotin;
" Keko xistin kemînê
Ser û çavên wî teqandin
Piştre daleqandin
Jê têr nebûn
Serî jêkirin
Bona diravkariyê gemar birin,
Kuçe û kuçe gerandin..."



www.netewe.com





www.netewe.com

* * * * * *

Pismamê Keko Elî Hecî
Dema ku dît şehadeta wî
Serê xwe hejand û bi kelagîrî
Go û got;
"Dijmin bi xwînê nema têr e
Keko mêrxas e, ciwanmêr e
Lê belê
'Berxê nêr ji bo kêr e'"
Paşê Elî Hecî hilkişiya girê Şavan
Ber ziyaretê Kalêspî rûnişt
Berê xwe da Duzgûn û agir vêxist
Bi hêstirên çavan dengê xwe ber ba xist
Go û got;
" Hêvîya min ji we ziyaretan nema
Êdi min xwe sipart agir û tavê niha"
Û bi xîske,xiskê dest avêt guhê xwe
Ji kezebê kûr lorand ew sitrana xwe
"Were Xalo, were
Qehwekê vexwe bi dilê xwe here
Zaroyên min guneh in, hûr in
Li halê wan binêrin
Rîya Amed, Palu ji me dûr in
Were Şex Seidê kal were
Qehwekê li ba me vexwe bi dilê xwe here

Lê dijmin çiqas bêbext e
Daxwaziya me çek û rext e
Ger Dêrsim felat bibe
Amed ji me re paytext e

Were bira Rizo were
Dijmin how û har e
Em hikmê Romê qebul nakin



www.netewe.com





www.netewe.com

Dewletekê sazûman bikin
Bi xençerê kurd ji xwe re

Îro Kurdistan talan û wêran
Warê Elîşêr şerkerê şêran
Bila dijmin bibîne şerê mêran
Were Elîşêrê min were
Qehwek vexwe bi dilê xwe here..."

* * * * * *

Memê Reş ê yekemîn
Mem xwarziyê Elî Hecî
Birayê Kekoyê Qepan e
Gelek rojan
Gelek caran
Ketiye nav şerê giran
Mem êriş dike wek guran
Datîne ser qereqolan mîna şêran
Roviyekî fêlbaz e
Cambaz e
Qandî xezalekê bi lez e, dibeze...

Piştî serhildana Dêrsimê
Tê li Edenê, Qeleqapiyê sitar dibe
Ji berî Cumaliyê zirav (Ince Cumali)
Peyagirê Edenê ye
Gelek axa û began
Xeracê distîne
Ji dewlemendan digrî
Dide destê feqîr û belengazan
Bavê sêwî û bindestan
Neyarê xêrnexwazan...



www.netewe.com





www.netewe.com

Mem
Bi qelaşiyê û bêbextiyê tê kuştin
Berî ku hê nehatiye kuştin
Ji piştmêrên xwe re halo dibêje
" Ne ba
Ne baran
Bi me nikare
Nikare di wê hesreta jînê
Yê ku dilê me de ye
Bikuje û bike wêran..."

XAL Û XARZİ

Wan deşt û geliyande wek teyrê Baz-i
Di bin honikhayi û siya darê mazi
Ketin xewe ke giran xal û xarzi
Rut û repal, ti û birçi, neçar û tazi

pişti baranê,xak bi bihna zemburê
Xum û xuma avê wek dengê bilurê
êdi xemd û xeyal bubû nanê tendurê
Daxwez ew bû,dengê Elişêr bi temburê

Koko û Memê duemin hawirdor nanêrin
Xeweke kûr de çiya bi çiya digerin
Bona aşiti û azadi yê dixwezin bifirin
Bê çeng û perin,ma bi ku ve herin!

* * * * * *

Memê Reş ê duwemîn
Xwarziyê Memê yekemîn û Keko
Kurê Elî Hecî
Û bavê min e



www.netewe.com

Memê reş dengbêj e
Temburvan e
Li dijî axa û began e
Dem zivistan e
Demê nêçîrê ye
Ji bo axa, beg û pîr
Xulamên wan
Derdikevin nêçirê
Nêçîra kewan
Ordegan
Pezkowiyan
Gur û roviyan
Memê Reş
Ji bo çend tazî - birçî
Û sêwiyan
Derdikeve nêçira
Dik - mirîşk
Berx û miyan
Yên wan kedxwaran hemûyan...

Rojekê axa û beg
Ew pevxebatkarên seg
Rûn û toraqê
Hêk û qeliyê
Pêşkêşî leşkeran dikin
Bona ku ew Memê bigrin
Tade lê bikin
Di zevîyê de Memê digrin
Li darê gêre ve girê didin
Bi şivên ter lêdidin
Piştre ava kelî
Li ser çavên wî de berdidin
Çawekî wi kor dikin
û bi hespê ve girê didin
Ber bi malê rê dikin



www.netewe.com

Êdî ji Memê Reş re
Dibêjin Memê Kor
Mem sitemkar e
Dîn û har e
Kevir, kuç û ristim di dest de
Ber deriyê axa û began tê û dere
Mem zeviyê wan
Bax û bostanê wan
Tev dar û ber û heywan
Dide ber bi agir
Yên wan hirç û howan
Û bazdide çiyan

Sala 1960 an
Bi zorkariya metingehkaran
Began û axan
Ji Dêrsimê koçewar dibe
Tê Xarpêtê gel Bahri Turgut
Xwe bergerîne û dibê
"Pênc zaroyên min hene
Ez ketime bextê te
Rêyeke, arikariyek bide me..."
Bahrî Turgut yekî hemdem e
Wê demê arîkariyek dide me
Emê disa vegerin bûyerên Memê me !
Apê Xid digot me
Ewa helbesta Mem ê me
Ji bo we
" Ey ! hawar !
Disan li ser rê me
Bendewarê kê me
Gelo, ez kî me / çi me
Bo çi belengaz bêxwedî me ?



www.netewe.com

œœœœœœœ
Ez di halê xwe de yek Ferhad im
Kor Memedê lawê Karduk û Med im
Tovê Dêrsimê
Gula Barzan
Û fêkiyên Mahabad im
Min rindî - başî
Û şahî -nenasi
Di şikeft û çîyayên Dêrsimê de
Tî bircî û tazî
Bi kêrê
Bi kevir
Û bi xwînê
Têkve bir zora qurşunê...

Nêçîrvanên serî
Digerîyan derî û derî
Min dît laşê Elîşêrî
Û gelek ciwanmêrî
Hiştî bûn bê serî
Bend xistin hustîyê mirovan
Hemî bi hevre girêdan
Dîl û bende kirin weke hovan
Li ser de jî êşkence û lêdan
Xwe bi zêran firot eşîretan
Paşê dijmin ew jî kutan.
Ahê kesi, ji tu kesî re namînin
Romî -wehş - hov û dev tijî xwîn in
Em hesret û bê war hiştin,ew ji bibinin..
Pêşerojê şêr rabin tola me bihewinin..



www.netewe.com





www.netewe.com

* * * * * *
Tê bira min
Dema ku ez zaro bûm
Çûm diziyê tirî û hirmiyên meta Por
Wê ez di nava rez de girtim
Dest ta kevir û ristim
Ez dam ber xwe
Min bazda bi lez hatim mal
Min xwe da pişta dapîra Fat
Amoja Por jî pey min re hat
Got û got
"Ka ew Roviyê sor li ku ye?
Dapîrê got
" Lê dêlê derdê te çî ye ?"
" Rez û hirmiyên min xira bûye "
" Ma tu nizanî ew zaro ye "
" Serê xwe bixwe mîna Qariyê ye "
" Şerm e Porê ji te ra
Ji bona çend hirmiyan
Ewa çi qare, qarî ye "
Amoja Por hêrs ket û çû
Min ji dapîra xwe pirs kir
" Ma, ew çi çavtengî û temayî ye "
Got
" Kurê min me di tevkuştina Dêrsimê de
Gelek neçarî dîtîye "

œœœœœœGELEK ROJ BİHURİN
Rojekê ez çûm nowê berx û karan
Ewrekî tarî hat li tev baran
Min go "ew çî ye"
Dadê got
" Ew, ewe daweta rovî û guran
Tu dê baş biçêrînî berx û karan



www.netewe.com

Şivan ew e ku nekeve leyîztikê tu caran
Şivan xapok heye, naxirê dide guran "
Min go
" Ma çitorê ye ew şivan xapok ?"
Go
" Têyreke bi şivan dileyîze mîna gok
Ew têyr pevxebatkarê guran e
Û neyarê şivanan e "
Wê demê
Tirêja keskesor derket
Wek xet li ezmanan
Piştî çiyan ve daket
Min got
" Ew çî ye ?"
"Ew pirê Zerdeşt e "
Min go
" Ma, Zerdeşt kî ye ?"
Got,
" Zerdeşt yekî rîspî
Rîspiyeki qenc û rind
Mîna tîrêja keskesor
Li ser bajar û gund
Di tarîya şevê de
Ronahiya hîvê ya find
Germiya dilê mirovan
Agir û pête
Şahî û serfirazî ye
Dermandarê saxî û jînê
Tavê vê dinê
Ew e ecdadê Karduk û Ariyan "
Cigerxwinê zana û pispor dibê
" Divê, em dest bidin hev
Xebat bikin roj û şev "
çend hezar sale ser me giran bû ew xew
Dijmin naxwaze em bên ba hev



www.netewe.com





www.netewe.com

Zerdeşt dibê
"Xwendin û Pêşketin
Û zanistiyê çênabe rev
Huner û marîfet e tev."
Zerdeşt dibê
" Ji xirabiyê, xirabî
Ji qenciyê, qencî dibe
Dawîyê qencî serfiraz bibe..."

* * * * * *

Ez dixwazim bibêjim li vir
Navê wan şerkerên nemir
Xidî Mamê Îse
Pesnê mirovekî dikir
(Kirîvê îwî s/ an jî Îvis )
Îwês yeki Fileh bû
Dengbêj û şerkerekî xîret bû
Dostekî dilgerm û zana bû
Îwês di sitranek xwe de wisa digot
" Eşiran li me xiyanet kirin
Ji bo Dêrsimê arîkarî nehate kirin
Ema, nayê bîrkirin îro zora me birin
Rojeki weji mina Filehan tev qirkin
Werin ji xiyanetê dûrkevin,dûr herin.
û Apê Xid domdikir,
Rojekê jin û bukên kurdhez
Ji vî re dikin qeliyê berxan û pez
Û ji bo şerkerê nemir Hesê Gewê
Dipêjin nanê tewê
Ji bo min jî ma nan û pîvaz
Awirên min tahl bû
Bona ku qelî û nenê tewê bû daxwaz "
Amojina Zêt got
" Belê rast e



www.netewe.com

Wan rojên teng û tarî
Me li ser Xidê kir serewde
Bo ku li malê runiştîbû wek ga
Me digot 'Wisa para te nabe bil ka ! "
Apê Xid çavçilûsî û diqarê
Radihêjî duxê bêrê
Û konê kêrê
Derdikeve li ser rê
Riya çiyan
Riya parastina gundiyan
Ji bo xilasiya neçar û sîwiyan
Asê dibe
Rojekê
Li serê çîyayekê
Rastberê Hesê Gewê tê
Xwe davê destên wî
Ew jî tê devrûyên wî
Nişkê de
Ji bo pirskirina pergal û xatir
Gelek mirov mîna rovî
Derdikevin li nav devî
Xid fam dike ku
Ew in ew piştmêrên wî
Mam Xid ecêp dimîne
Dema ku di rex wî
Jin û qizan jî dibîne
Ji kêfxweşiyê dikene
Dibê
"Çi karê wan heye li vî enî? "
Hesê Gewê tuncik dide xwe û rûdinî
Dibê
" Xidê min çavên te ronî
Bi vî awayî emê axa xwe xilas bikin
Ji destê dijminê xwînî



www.netewe.com

Xidê min ma tu dizanî
Her kî ku tilîya xwe li çavê me xinî
Baştir bizanibe ku, nikare çavên me derxine
Ka, bibêje te jî, ji bo me çi anî? "
Apê Xid digot ecêp mam
Di çok û juniyên min de nema qam
Û min fêdî kir
Gelek berxwe ketim û got
" Xwina min ji, ji xwina we ne zelaltir e
Li ser riya me tijî evraz û tir e
Ez ê bibim rê hewal ji we re
Bila xwina min ji biriji
Li ser xakî welat
Ji bo felat..."
Wê şevê
Di şikeftekî de
Bi hev re
Parve kirin qelî nanê tewê
Heya sibê li ber nowê ma Hesê Gewê
Û şerkerên nemir bi hev re ketin xewê
Heya berbanga sibê
Bi xêr û parastina Hesê Gewê

* * * * * *

Wan rojan çiya bi çiya digeriyan
Serma - nexweşî nêrzbûnê dest pê kiribû
Zikê xwe têr dikirin bi giya û berûyan
Ji bona ewan şerkerên nemir
Êdî xemd û xeyal bûbû
Xwerina qelî û nanê tewê
Mina sitraneke tijî xem û kul
Ji ewan qetiyabû Hesê Gewê
Bûbû êstirê çavan
Mîna stêrikekê



www.netewe.com

Daketina wî xewê şevan
Di şikeftan de, bin zinaran de
Di nav gelî û zozanan de
Riste û misreyên sitranan de
Li ser zimanê dê û bavan
Dihat ziman ji bo xort û qîzên ciwan
Ewe " Dimire û zindi ye Pîr Sultan "
Wisa dihat lorandinê ew destan
" Herê lê hayê, hayê
Li min dinyayê
Bibêjin ji min re
Gelî der û cînaran
Der û deştan
Der û deviyan
Ji bo çi Hesê min nayê
Dem bihar e
Were lê Were lê
Çiyan berf dihelê
Destên xwe di destên min de lê
Ez ne xort im
Dilê min ji te dihelê
Herê lê hayê hayê
Ax ! li min diyayê
Dijmin em xwarin
Ji bo çi Hesê min nayê...
Ji bo çi mêrxasê min nayê "

* * * * * *

Yên bakî mayî
Xwe dabûn çîyan
Çiyayên bilind li banî
Çiyayên ku hulî û baz hêlîna xwe datinî
Û dema ku balafirên romî
Ji asumanan agir dibarînî
Qîzeka deh û pênc salî



www.netewe.com





www.netewe.com

Bi kevirê qanikê, serê pîlot diteqînî
Balafir nizm dibî
Li ser zinaran
Dadikevî
Bi teq û reqînî...

* * * * * *

" Her evin bedela gulekê ye
Û her gul evînê tine ziman "
Xort û qizekê destên xwe dan hev
Yek nêrkew bû, ya di jî kew
Xwe saprtin şikeftekê tew
Kewê got
" Çavên min giran bûn ji xewê "
Bi dilekî şewitî lê vegerand nêrkewê
" Ez ê bigerim xwarinê dû re em ê razên bi nowê "
Û vî kewa xwe cî hişt li wê
Derket gera xwarin û nêçîrê
Her der bi berfê hatî bû xemilandinê
Wê demê wisa giran - biha bûbû ku
Gîyayekî hêşin nedida hemû malê dinê
Berfînek dît û dest dirêj kir berfînê
Berfînê hawar kir û got
" Hey wax ! li minê "
Nêrkewê got
"Çare nîn e em ketin mirina nêrzbûnê "
Bi dilekî xemgînî
Çavên bigiri
Got berfinê,
" Here li ser zîyareta Duzgunê
Sond bixwe li ser agir
Tuê bibînî hinek heval û hogir
Yên asê û herî peyagir
Û dema ku



www.netewe.com


Tu jî, ji wan cuda bûyî
Bi keder û xem nebe
Ba te çi tiştên xweş hene
Ewan tiştan dostên xwe de "
Nêrkewê got
" Ez evîndar im ji yekê hez dikim "
Got berfînê
" Dilê xwe bide "
Tê gotin riwayet ew e
" Bi navê qencî û ronahiyê
Vî bawerî da Zerdeşt
Û sond xwar li ser çiya û deşt
Rêhewal gîhan hev kete para wî goşt
Ji sedem evîn û hezkirinê
Berfînê şanî vî dabû ew geşt "

* * * * * *

" Ax ! mala minê
Xwelî li serê minê "
Got Hemê Dêrsimî
" Di newala Qutiyê de
Bi hezaran şerkerên çeleng
Tev kuştin, qirkirin
Ew laşên zaroyan
Jin û mêran
Yên tev birîn bi gulle û kêran
Avê de diçûn
Xwe li hev dipêçan
Yên birîndar
Serî hatî bû jêkirin
Hûrê jinên avis
Hatibû vekirin
Û ew zaroyên ku ji ber dê dikirin
Ji serê xişt û pîjikan ve dikirin..."



www.netewe.com





www.netewe.com

* * * * * *
Apê Ehmed
Yan jî Hemê Dêrsimî
Hê ku ez bûbûm mîvanê wî
Min got
" Ez şoreşger im "
Sedem ez xwe şirîn bikim ba wî
Bi çavekî jar li min nêrî
Huş bû yek muyê wî nelivî
Bi gopalê xwe erdê xêzik çêkir
Kûr bi kûr raman kir
Bêdengiyekê gotinê min bir
Durre riyê xwe yê spî mist da
Û dest bi gotinên xwe kir
Go û got
" Kurê min ! di nanê me de xwê tune "
Ma, tu dizanî şoreşgerî û welatpirêzî çi ye
Seyid Rizo, Elîşêr û Baytar Nurî kî ye ? "
Min got
" Bellê min di derheqê de gelek xwendiye "
Go
" Ji te re mîsalek bibêjim
Demekê ne dûr
Çend leşkerên romî
Yekî ji me digirin
Bi lêdana ço û keviran
Serî û çavên wî digurin
Ew tim û tim dibêjî
" Ax ! pişta min "
Leşker jê natirsin
Ji vî dipirsin
" Malxirabo me serê te hûr kir
Ji bo çi tu dibêjî `pişta min'
Kurd lê verdigerîne û dibê



www.netewe.com

Heke pişta min hebûna
Ma, we dikarî li serê min dana ' "
Yekî kal got
" Ew bûyer ne wisa ye
Dema dijmin li wî dide
Ew dibê
" Min hûn sipartîn Xwedê "
Hemê Dêrsimî got
" Welê an jî hanê
Pêwist nîn e her tişt
Bibe hewale jorê li banî...
Min ji we re
Misalek ji rastiyê anî "
Wê demê
Dest bi axaftinê kir Apê Welî
Got
" Min bi çavên xwe dî
Miqabilî pênc laşkeran
Qemerê Şadî
Gulleyên wî neman
Bi kevir û xweliyê berxwe dida
Leşker nediwêriyan li ser wî de
Çend rojan şûnde hate girtin
Dest û piyên wî girêdan
Bi êşkence û lêdan;
Min bi lezê piştmêr li hev gîhandin
Bû toz û dûman hemû meydan
Me tev ew kuştin, serde jî du şehid dan
Û ez brîndar ketim
Me meyîtên xwe hilanî
Li ber balgiyê ewan kevir danî
Û me berê xwe da gomê
Gomekî xopan û vala bû
Ji sedem tî û birçî bûnê
Rêhevalekî got



www.netewe.com

" Ezê herim "
Wê demê di navbera me da dubendî çêbû
Me kir ne kir ew ji me cê bû
Wê şevê xew neket çavên min
Û min raman dikir
" Gelo ecep çi bû ?"
Di wê gavê min guhê xwe da ser
Deriyê derva û qulikê derî de nêrî ku
Çend leşker tên ji hember ve
Min hevalên xwe rakirin
Ji xewa şêrîn şîyar kirin
Nivînên wan tijî ka kirin
Ew ka bi gazê av kir
U lihêf serve kir
U me xwe da pişt derê malê
Dema ku ew hêdî hêdî
Ketin hundurê malê
Çekên destê xwe bi hev re lax kirin
U bi singo ew nivînên me nîze kirin
Ci de agirekî dîn û har pêket
Me xwe avêt derve û derî li ser wan girt
Qerîn û hawar ji wan ket
Xanî tev şewitî, yek ji wan sax derneket
Em wê şevê bi lezê
Tî, birçî û bi bezê
Ketin nava mêvên rezê
Hevalekê got " tirî "
Bi çavekî girî



www.netewe.com

Yekî din got "mirov bixwe tirî
Ewê namirî "
Mirin li nêzikê me digeriya
Bêçare,
Me zikê xwe têr dikir bi çilo û beriya
Me hê tu tişt nedît
Çi dît ewan dît
Ho gidî felek
Em sax man ew bûn şehit..."

* * * * * *

Ew ewrên tarî û giran
Bi ser me ve hatin
Şewitiya her der dil bû sotin
êş û jana Dêrsimê xilas nabe
Tenê bi gotin...

* * * * * *

Li gundê Orsê
Kirîvê Dursê
Hesê Dirêj
Got
"œœœxwezî bila dijminjî werin
em mîvanperwer in
Rastî û durustî
Qencî û rindiyê digerin
Ma xwasteka te çi ye
Ka bibêj emê guhdar in "
Û qutiya titûnê dirêjî min kir
Ji cihê xwe rabû, çû pencere vekir
Destê xwe ba kir
Û bang kir
Got Hesê Dirêj
" Mistoo ! "



www.netewe.com

Ewê derve ku navê xwe Misto ye
Got
" Çi ye heyran bibêj "
Kenî û got Hesê Dirêj
" Ma tu dizanî wayî rex min kî ye ?"
Got
" Ma ez çi dizanim kî, kî ye "
Hesê Dirêj got
" Ew Qopo ye "
Mistê got
" Ma tu bi min dikenî
Te, ew navê rûmet ji bo çi bîranî "
Hesê Dirêj got û kenî
" Kero, kerê bêfam
Em ji devrîmciyan re "şoreşger"
Dibêjin Qopo, ma, tu nizanî "
Û carekî din
Hesê Dirêj û Misto
Bi hevre yekdevî keniyan
Min ji wan pirs kir
" Ma, ew qopo kî ye, çi ye ? "
Misto kete hundir
Got
" Mawxêrdî " û domkir
" Hesê Dirêj baş dizane bi van çîrokan
Dema ku navê wan mêrxasan bêziman
Pêwist e ku xew nekeve çavên zarokan "
Hesê Dirêj bi kuxikê gewriya xwe pakir
Dest bi serboriya Qopo kir
" Tev xopan di şewitiya gom û gund
Bê deng mabû şalûl, ser me dixwand kund
Ew Qopo yi mêrxas, zilamekî genc û rind
Rojekê deşt û zozanan derbas bû
Mina bayê sehera sibê hilkişiya serê çiyan



www.netewe.com

Yên ku di rex vî de ne çûyî bûyan
Çermê wana dihat gurandinê mina mihan
Yên din raçav bûn, hinek ji wan
Hatin girtinê, bê dadi hatin kuştin
Ji bo Qopo yek rê û yek tixub hebû
Teslîmiyet an jî berxwedan
Li berxwe da teslîm nebû
Di wê demê de ji rêhevalên xwe re wisa gotîbû
" Pêywist e ku êdî hemû şiyar bin
Bişîkînin nîrê zordestiyê
Li hespê aşitiyê siwar bin
Êdi bes e kêr gihaye hestî
Bimre koletî û bindestî
`Berxwedan jîyan e ' ewe rastî
Em ê dest xwe xînin
Azadî, aşitî û dostî..."

* * * * * *

Tê gotin
Ewan rojan
Di nala Laçê
Di nala Qutiyê
Mîratê
Çor ketiyê
Bi cendegan
Bi xwinê
Xum û xûm e dixwûnî
Û jor li banî
Gire gira balafiran
Di ser de agir dibarînî...
Tê gotin
Ava Munzur sor û reş bûbû
Yek xwin û
Yê din porên jinan tê de diçû
Ew porên dirêj



www.netewe.com

Mîna pelên darê
Ketibû nava xwîn û avê
Dibiriqiya dema ku lê dida tavê
Xwe li hev dipêçan
Laş û cendegan
Avê de diçûn wek şinordegan
Tê gotin
Xwinê dagirt hemû kort û çalan
Ber bi jana wan
Dar dihejiyan heya rîçalan
Jinên zikgiran laçê bûn li deviyan
Zaroyên şîrmij hatin kuştin li ber çavên dêyan
Yek ji wan
Zana û dilovan
Bi çavên xwe dît
Ew bûyerên han
Û got
" Her heyî yê ku dixwaze bijî
Ew ê pevçinin"
Ew Beytar Nurî Dêrsîmî ye
Xelk û alem dizanî Ew kî ye
Li ser axa mezin û rûmet şa bû
Li gel Elîşêr û Sey Rizo asê û dijraber bûbû..."

## HİNEK BÛYERÊN DİN Jİ HATİN GOTİNÊ

Heci
Bavê bapîrê min bû
1925 ê de nefî bû
Heya Bursayê tê şandin û
Tu kes pê nizane ku
Hate kuştinê an jî winda bû !...
Elî Hecî
Sed û pênc salan
Temenê xwe domand
Li ser dert û kulên welat
Dil bi keser pir caran lorand



www.netewe.com

Û qala serpêhatiyên xwe dikir
Digot
" Min heye gelek raman û fikir
Lê belê mafê me xenîmî wan be
Romiyan zora me bir, welatê me talan kir
Ji sedem bindestiya me, me xwe fêrî
Xwendin û nivîsandinê nekir "
Em neviyên wî bêxêr in
Bona ku ew dîtin û ramanên wî berhev nekir
Elîyê Hecî jî mîna bavê xwe Hecî
Koçewar bû li xerîbiyê mir
Dildizîya sed û pênc salan bi xwe re bir
Di sala 1982 an de li bajarê Îzmitê
Li gundê Kose çû heqiya xwe
Ji sedem kurdbûyin û
Baweriya Alewiyan
Melle gote gundiyan
"Ew gawir e" û
Quran li ser wi nexwend...

* * * * * *

Weliyê kelêşan
Êsir dikeve û nizam çawa direve
Ta ! di Emerikayê ve derdikeve
Dibên bîst sal şûnda
Pişt tijî zêr vegeriya
Ew xapandin zêr ji dest girtin
Tî û birçî mir li ber deriyan...

* * * * * *

Kurê Qepê
Birayê Keko û Memê
Husî Qepan
Sîxurê birayê xwe
Da ber xençerê
Tola xwe girt bi kêrê



www.netewe.com

Romiyan deh û heft sal ceza da
Û ew di girtîgeha Xarpêtê de ma...
* * * * * *
Mala Hêmedan
Mala axê
Û hinek tirşikxwerên wan
Bûbûn tevxebatdarên neyaran...

* * * * * *
Welî Xakî
Axayekî ser axan bû
Destê Diyap Axa yê rastê bû
Xanedaniya wî ji sîxuriyê bû
Ew têkiliyên han
Gundiyan ne dizaniya
Dema ku emrê wî têr bû
Hinek gundiyên nezan
Mayîtê wî ta ! Li Ertxanê
Anîn Rîçikê helanîn
Li pêy cenaze hezar mirov civandibûn hev
Dibêjin
" Ristî Heseqilan aciz bû
Heya dawîyê radyo vekir "
Û digot
" Têw ! têw ! "
Û gotina xwe wisa dom dikir
" Ewa kuçikê li ber deriyê min
Ji wî çêtir e û xawên e
Wek wî ji eslê xwe re ne xayin e "

* * * * * *
Bi sitranan dianî ziman Sey Welî
Hê şin û têkve çûyînê Husên û Elî
Eliheyder laleke sitranbêj bu



www.netewe.com

Bi kezebê kûr lorand û digo,
Naçim Erzinganê,Erzingan nalebar e
Dil birin im,birina dilê min pir har e
Feqir Rizo ji bo welat dike hawar e
Dil birinim,birina dilê min pir har e
Iro ji bo xelk û alemê roj û şahi ye
Ji bo min çima ew şev û hêvar e
Dil birinim,birina dilê min pir har e...

**EZ Û HESENÊ ŞEKİR**

Min demeke veşartî de civîn pêk di anîn
Her nasekî bi xwe re dostek di anîn
Yekî kal hat hemû ber wî rabûn
Wi got " Rûnin "
(œœœœœœœœœœœœœœ)
Got
" Ma, tu ditirsî ? "
" Xwezim bizanim çi karî dikê
Ji mala kê yî, çi kesî "
Min got
Ez ji bêbextîyê ditirsim
Pêwist nîn e ku karê min bê pirsîn
Ez kurd im, îzolî me
Ji Rîçikê
Kurê Memê Elî Hecî me
Go " Ma tu yî Talî yê me ? "
Ew bersîv ji bo min ecêp bû
Bo ku navê min î eslî ew bû
Li ser Elewiyan
Li ser çepan
Li ser rewşa Dinê
Û ya hemû miletan
Em bi hev re ketin misletan
Ez dixwazim bêjim



www.netewe.com

Nêrînên Hesenê Şekir bi helbestan
" Xwezî şuxulê xwe yê îroyîn mehêle ji bo sibê
Ew rewrewika jîyanê te kewaşe bibê
Di bin rewneqa têkoşina Elewîtiyê
Xilasbûn tune, zor û zilm hê bê

Pesndayîna Elî û Pîr Sultanê kilambêj
Axaftinên wan gelek mezin û stûr
Rexneyên wan gelek dijwar û tûj
Çend sed sal in, ew şûr nehat sûtin, nebû pîj

Baş bizanibe ku dixwazî tiştekî çê
Serhildanê şer dest xistin, tiştekî çêtir e ji çê
Ji bo têkoşêriyê derefşe Elî û Pîr Sultan hê
Bêdeng û bêzar man û perestin çênabê

Bizanibe ku, ji bo armanc û idealek
Şer û xebat pêwist e û dijraberiyek
Roj dibuhurin 'Bi tirek, bi tembûrek '
Daxwezî ewe manîdar derbas be jiyanek."

## BÛYERA SENEMXANÊ

Wê demê mala me li Edenê bû
Jinek hat li ba me mîvan bû
Navê wê Senemxan bû
Ew bûyer wisa çê bûbû

Te digot ma dilê wê bi mengenê
Bi axaftina wê tê guvaştinê
Ji bo bavê xwe derketibû gera dinê
Nedizaniya ku wî çawa bibîne
Bapîrê min jê pirsî û got
Ma ew bi kû ve çû, kû ve hat ? "



www.netewe.com

Go " Ezê nizanim wisa rehet
Bibêjim te, çi bi serê me de hat "

Senemxanê êstirên çavan barand
Derd û kulên dilê xwe lorand
" Dijmin di ser me ve agir barand
Gelek kuştin, yên mayî derve şand

Wan rojan vala bûn hemû gund
Bextxîrakirî bû, bê peyman û sond
Heftekî şûnde bavo dizî hat gund
Go " Ez ê herim, disan ser me xwend kund "

Imam Riza êstir ji çavan barand
Dert û kulên dilê xwe wisa lorand

"Em xistin Tirênê,awêtin serhev
Tirên ber bi rojhilat çû roj û şev
Em dan bin gazê fetisandin tev
Min xwe jê avêt, ew bû xilasbûn û rev

Min xwe sipart salan ger ez nemirim
Rojên teng zû dibhurin, divê şûnde werim
Xatirê we ezê herim, nizanim ku ve derim
Bi hesreta welat lal û kor im. "

Senemxanê êstirên çavên xwe barand
Dert û kulê dilê xwe lorand

" Min sîh sal bi rojên giran ve mît
Çi bikim, min ji bavê xwe ram nedît
Di yomê Dêrsimê de can da gelek egit
Bir û bawer im, hê ew dijî nebûye şehît "



www.netewe.com

Senemxanê go " Min bîhîstiye
Li Ceyhanê rispiyek heye
Çawa ku tê gotin ew bavê me ye
Em ê herin ka çi xêr tê da heye
Gelek car çêbû çuyîn û hatin
" Ew camêr hevalê Imam Riza ye " digotin
Sedem ew e, carê xwin bi xwinê hatiye şuştin
Ewa Senemxan pînc e û diya wê hatîye kuştin

Min soz dabû Senemxanê
Ku binivîsînim vê meramê
Bila hemû dinê bê xwendinê
Çi dibe bila bibe
Rastî bê şanîdanê
Û zaro neyên xapandinê...

## NURÎYÊ EGİNÊ { * }

Nurîyê Egînê
Nalet li wî dev xwînî
Ew laşên mirovan
Yên miriyan, qîz, jin û zaroyan
Dide ber bi pîhînan
Dibê " Min ew tev gewer kirin "
Şa dibe û dikene mîna dînan
Guhê wan, pozê wan jê dike
Ji bo diravkariyê destê xayînan
Û dibîne ku leşker ji dûr ve tînin
Deh gundî û du jinan
Mawzerê xwe davê
Makîna giran dest xwe dixe wê gavê
Tirsa re leşker baz didin bi revê
Ew makînê lax dike li ser gundiyan
Li diyarê diwazdeh Imaman



www.netewe.com

Kes tune ku ji bo ewan ax ! bike
Nurîyê naletulah li ser laşên miriyan
Şarjorekî dinê lax dike
Berf û xwin tevlihev
Dibe lêhi ber ava newala spî diçe tev...

(*) B.Baykara/Dêrsim 38/2.cilt,rupel 118-119 Eğinli Nuri
(ew leşkereke Romi ye,niviskar di pirtukê xwede mina qehremaneki pesnê wi dide..)

## BÛYERA SEY HUSÊN

Li gel çend leşkeran
Asê bûye li çiyan
Gelek kes wî dinasin
Mina şivanê pez û mihyan

Li ser girekî Munzur
Di rojeke payîzê de
Sey Husên bi xîzê xîzê
Xwe dide paş kevirê reş
Li banî nizim dibe
Balafirekî reng beş

Husên bi qanîk kirinê
Li pîlot dixe derbekî mirinê
Balafir bêtewş dadikeve
Li ser zinarên bê dawî bi şiringînê

Dîsa rojek, ji rojeke havînê
Ew dijmin, dijmin wî dibînî
Ji bo xilasbûnê çare namînî
Sey Husên;
Gelek sinc û hej, qirş û qal tînî



www.netewe.com

Xwe di nav ewan de vêşêrînî
Tê de erdê kolî dikeve kemînê
Dijmin newêre bi ser wî de here
Heya sibê bi erd kolanê gelek wext tere
Roja din ber bi nîvro
Dijmin hawirdor li cîyê wî digire
Ku serî û çavên Sey Husên biguhure
Ew wê demê kincên xwe dişewitîne
Ew sinc û hejan vêdixîne
Tunelê di paş ewan re derdixine
Bi qanîkê par re lêdixîne
Û serî û çavên ewan diteqîne
Dijmin paşiyê bernade
Tê gotin;
" Sey Husên camêrî bi înat e
Wek masî ye, têr e, mar e, şêr e
Bedêlî sedî jî canê xwe nade

Rojekê li ber avê lê teng dikin
Ew bi qanîkê, leşker bi tifingê şer dikin
Xwe ser jêr dinoqîne avê
Av tijî ceset û xwin e wê gavê
Wir xilas dibe, derdikeve ber tavê

œœœœœœœœœœœœœœ
Wisa tê gotin;
{ Ew heft canî bû
Navê wî heft caran
Mirin û jîyan bû }
Heya roja îroyîn jî
Tu kes nizane ku
Çi hat serê wî, hê çikir û
Bi ku ve hat û bi ku ve çû...



www.netewe.com

## BÛYERA AMOJA ZER

Amoja Zer
Çû ser
Ziyareta Bavmansur
Bo çend zaroyên bê qisûr û hûr
Bergeri ji Bavmansur
Tewarek jê girt
Ji bo xêr dîtinê
Û
Yoma wî bi xêr hatınê
Û ji zîyaretê xêr nedît
Seh kir ku
Li pişt gundê Iksorê
Di şikeftekê de li wê derê
Xistine ber agir û gazê
Dused û çil û sê zaro
Dikizirîn tê de nayên derê
Dê, rebenê Amoja Zerê !
Bi qêrîn hawarê
Porê xwe diruçikînî
Xweliyê serê xwe dike û dibê
" Min gu li te kirê qederê ! "
Ew roj va roj e
Gel hîç yek gotinê bawer nake
Av raweste Romî zilm û tadeyê xwe dom dike
Newalên ku daneketin
Zozanên ku derneketin
Û xirabiya ku nekirin neman



www.netewe.com

* * * * * * *

Fewzî Çakmak
Li tevgerê nêrî
Abdullah Akdoğan
Kawilkirinê digerî
Û wan rojan
Ji asumanan
Belavok dibarî
Bona ewlekarî
Naverok wisa dibe diyarî
" komara hikumetê we bi piyarî
Û dilovanî
Dixwaze bigrî himbêza xwe
Û bextiyar bike
Hawirdor li we
Hatiye girtinê
Iteat bikin û teslîm bibin !"
Belavok dadikeve ber
Amoja Zer
Digirî û diçe şanî dide serleşker
Dibê;
" Min tune oxur - yazar
Ka hebûna dert nedibû hezar "
Serleşker lê vedigerîne bi zare zar
Dibê;
" Em mislimanên dilovan
Hûn asê bûne bin bandûra neyaran
Xwesteka me ew e
Hûn jî bijîn wek me bextiyaran
Û şarezeyî bê van diyaran "

Amoja Zer tiliya xwe gez dike û dibê
" Têw ! de qayê van keran "
Û serleşker dide ber kêran



www.netewe.com

Nizam bi çend derb û caran
Piştre êriş dike ser leşkeran
Li ber xwe dide wek şêran
Tê gulle kirin bi derbê giran
Dibê;
" Mislimanên pîs û heram
Wekî Xizir dide
Çawa hûn disitînin gelek can "

* * * * * *
10 Îlon 1937
Seîd Rizo
Diçe Erzinganê
Ji bona peymanê
Û tê girtinê
Her tişt ji gel tê veşartinê
Di radyo û rojnameyên romî de wisan tê gotinê
" Serokên tevgerê teslîm bûn
Peyagirên herî mezin hatin girtinê "
Yên ku tên girtinê digirin
Çermên wan diguhurin...
Û gelek dîl bende jî
Tên koçewarkirin......

## BÛYERA KULEK OSMAN

Osmanê Kulek
An jî Osmanê Laz
Nijdevanekî xedar e
Dest xwîniyekî har e
Pesnê wî nayê dayin
Yeki nalebar e !
Di pirtûkekê de wisan hatîye { * }
Eyûp Begê Ovacikê yê birêz



www.netewe.com





www.netewe.com





www.netewe.com

Dibê;
" Di nav fêkiyan de puç e gêraz
Mirovan de jî Laz ! "
Osmanê naletulah
Di serhildana Koçgîrî de
Tu jindarek sax ber neda
Şêrên Dêrsimê ew guwaşt di Erzinganê da
Romiyan ew xelas kir ji naw lepên wan da

## BÛYERA ÎMAM RİZA

Tiştên qenc
Rind û xirab
Bê can
Bi can
Ji heywan heya mirovên dilovan
Zêdetir ji kuştina mirovan
Di wê rojê tev kuştin ji bo diravan
Bi hukmê Abdullah Akdoğan
Gazî kirin hemû mirovan
Gotin,
" Dakevin jêr ji nişûvan
Yên ku teslim bibin
Emê bi navê azadî û aşitiyê
Piroz bikin ewan
Efû bikin heman "
Ax derdê sermayê
Nêrzbûnê û nexweşiyê
Kes nizanî
Romîyên bextkawil
Ew xapandin

(*) Faik Bulut / belgelerle Dêrsîm raporlari 1992. rupel.204



www.netewe.com

Ber bi jêr anîn
Li hember ewan
Makînê giran danîn
Laxkir û lê reşandin
Mina lehiyê xwîn rijandin !
Imam Riza jê filitî
Ax û wax kir
Pişta xwe xar kir
Xwe avêt paş darê merxê
Canê xwe xilas kir
Dijmin laşên zaroyen wî
Li ser singo ve kir
Namusa wî qirêj kir
Xwe bi xwe go,
" Namusa herî mezin welat e "
Berneket !
Xwe sipart û ji quncên daran derneket...

## BÛYERA ELÎYÊ MİSTEFÊ

Li ser girê Zelê
Miqabilî ordiyê bi tenê
Nahêle dijmin ber bi gund bê
Kîjan serî ra dibê
Ew yeman lê didê
Serokleşker yên rex xwe re dibê
" Kî ye ev zalim kurê zaliman çi înad e
Sê roj in nahêle çavên me vebe
Serê vî girî girtîye rê nade "
Tê gotin,
" Ew Elîyê Mistefê ye wan bernade..."




www.netewe.com





www.netewe.com



ADİL DURAN



www.netewe.com

## BÛYERA SEYÎD RİZO

Dêrsimê kevneşopiya toreyê me ye
Li ser çavkaniyê Munzur sond xwarin heye
Seyîd Rizo li wê derê di civîneke da ye
Dibêje:
" Niha baş hatiye famkirinê ku
Mistê Kor bi hezar fêl û fênd û belan
Ji bo kavilkirina Dêrsimê rêz kiriye
Zan mekin ku niyeta ewan bi tenê
Baç jê girtin e
Ewan Dêrsimê { * } Şax Xizir
Bi navê Tunceli kirin bajar û
Bi Enqerê ve girêdan
Havîrdorê me jî
Bi leşker, tank û topan pêçane
Ew mirovên me yên gundî û rênçber
Bi zorî dîl û bende dikin
Di kar û barê xwe de dixebtînin
Yên ku kurdî deng dikin lê didin
Ew çêkirina qereqolan, pir û rê
U dibistanan
Ne bona qenciya Dêrsimê ye
Muradê ewan ew e ku kokê me
Ji holê rakin..."

{ * } Di 1839 an de Dêrsim di bin hukimranîya Şax Xizir de ye.



www.netewe.com

**ELÎŞÊR Bİ XWE BÛYEREK E**

Li aliyê din di nav gel de
Bîr û baweriyek mezin da
Êlîşêr bi sitrana xwe ya têkoşer
Bi gilî û gazin
Mîrov dixe bin bandura netewî û civakî
Ew sitran roleke gelek dijwar dileyîzin
Mînakek;
Girt Êlîşêr
œœœœœœœœœœœœœœœ
" Welatê şêrane rovî nakevinê
Rastî tê de veşartiye, nabe bi aqil gîhiştinê
Gulê Kurdîstanê ye, destê zaliman nayê civandinê
Ji bona wan veşartiye riya Dêrsimê..."

* * * * * *

Elîşêr,
Bi aqil, bi huner û marîfet
Û bi kirinên xwe ciwanmêr e
Ew, Kawa yê Dêrsimê ye
Pevçunê de şêr e
Di dilê me de qedr û qîmet e wek mîsîzêr e
Ew ronahî
Ew reng
Ew deng
Ew sitrana efsanewî
Tê gotin,
" Sêpê ye derguşa gernasan
Koçgîriyê de ber xwe da wek mêrxasan
Dîyap Axa
Û Rêber
Olî ya wan dirav e
Çekên wan derewe



www.netewe.com

Û Ferad
Û Murad
Û Munzur
Û Harçik
Ta, îro xîyanetê wan
Xaînan direve...
Girt Êlîşêr
" Êlê Ovacixê
Dagir kir her der
Piştre hawar nehat
Û hewl neda xwe Hozatê..."
Tê gotin
" Paşayê kor
Serokeşîrê Kureyşan
Mil neda
Rê neda
Pêşiya wan antaq veda
Û go
" Em ê şer bikin
Demê ku hun bên vê de..."
Elîşêr got
" Em birakûjîyê naxwazin, "
Û di gel Memedalî
Nurî Dêrsimî
Memo
Dilo
Li ser Kemah û Arapgîrê ve
Berê xwe dan Dêrsîm ê
Gotin; " Bila bê zanîn
Em mina şêr û pilingan
Nabin ji dijmin re
Wek hacet û lingan
Em tev bidin mirinê berê xwe
Xwar nekin serê xwe
Çavên wan derînin bi tilî û nînûgan..."



www.netewe.com

* * * * * *

Piştre dijmin, bi dirafdanî yekî dizî
Hinek serokên eşîran dike razî
U serokeşîrê Yusufxan Kamer xwe difiroşî
Bextê xwe xiradike...

## SEYÎD RİZO DANASÎNEK (NOTA) DİDE DEWLETÊ

Ew kalê rîspî
Pîr û pîr
Rêber, zana û jîr
Pîr Sultanê hemdem
Seyîd Riza
An jî " Qizilbaşekî asê !"
Bi konekêrê û doxê dasê
Pirsgirêka Kurd bir danî ser masê
Da ku, çareser bike bi her kistasê
Kistas ew bû;
1- Li Dêrsimê pir û rê neyê çêkirin
2 - Qereqol û dibistan çênebe
3- Ji bo berhevkirina çekan, lêqelibin çênebe
4- Baç girtin wek mîna berê, bi bazariyê bê dayîn...

* * * * * *

Çawa ku tê gotin
" Tu serê vala hildê,
Ne hildê çi feyde..."
Çiya teqiya
Pêt û agir bilind bû
Heya banî çû...
Dijmin:
Di 8 Gulan 1937 an de
Bi 310 yerbaz



www.netewe.com





www.netewe.com

Bi 8313 leşker
Bi 261 makîne sinik
Bi 32 makîne giran
Bi 28 topên çiyan
Bi kîmya û gazê
Bi hezar fêl û fêndan
Êrîş bir ser bajar û gundan
Têrî xwe zor û zilm kir
Dêrsim xopan kir !...

* * * * * *

Lêçiqas bê berketin
Mirina mîrovan
Ya dêrsimê jî qasî ewan
An jî herî hindik be !
Bila bibe !
Ew zaroyên me yên ku hene
Yên ku hê çênebûne jî , di rêzê de ne
Bes me sond xwariye
Heya ku di darê dinê de
Jîyîn heye
Berxwe bidin
Can azad kin !
Ji bona me ew mane
" Ya niştiman, yan neman " e

* * * * * *

Bi awayekî din
Bi zarava Dimilî
Sitranek tê gotin
" Min çû dît kû
Hawîrdor li mêrxasê min girtine
Bi nizmî dibirin
Kurê min bi can



www.netewe.com

Dest û piyê wî girêdane
Li ber tava payîzê berdane
œœœœœœœœ
Jinan bi nal û nal ê
Xwe avitine ser cendegan
Dibêjin:
" Derdê cigerê zor e "
Zalimên dinê û bêtore
Kuştine xortê Dêrsîmê
Laşê wan avitine ser hev
Ax ! li min, ax ! li min...

## PİRTUKEK Û HİNEK BÛYERÊN DİN

" Leşker bêdengî hatin
Konê xwe li herîmê me danîn
{ * }...
Disa ew rojên tirsê bûn
Min hesp girêda li zeviyê firêz
Leşker ser gundê me ve bûn rêz bi rêz
Serokleşker ji min pirsî û got
" Navê te çi ye ?"
" Şukrî "
" Tu Tirkî dizanî ?"
" Herê "
" Xwendin û nivîs ?"
" Belê !"
Û serleşker raman kir
Şunde li hevalên xwe nêrî
Û got
" Dibêjin ew wahş in
Binêrin bi Tirkî axaftinên xwe çi xweş in

(*) Dêrsim isyanindan Diyarbakira,Şükrü Laçin Sun yayincilik mart,2,s.23



www.netewe.com

Ahmet Korkmaz wisa digot; { * }
`-Wê şevê leşkeran em dan barxwe birin
Mixundiyê (Darikent)
Xistin konan konên laşkeran
Hundur tijî girtî bûn
Ew jî, ji gundên din anî bûn '
œœœ
Sibê tev leşkeran
Em derxistin ser rê
Mirovên ku rêz bûbûn
Min li wan nêrî
Hemî nas û dost bûn
Min ji wan pirsî
` Ji bo çi hûn hatin girtinê ?'
Pirsên min ne ew bûn tenê
Dema ku min bersîv girt
Her tişt baş fam kir wê demê
Ji hinekan re gotine
` Tu axa yî ' ` tu pîr î '
`Çekê te heye tu peyagir î '
Û her wekî din xwe bi xwe
Gelek sedem peyda kirî
Bila sedem em birin Bajarê Amed
Bi êşkence û tade li me reşandin
Tev kuştin yek jîndar sax nehiştîn..."

* * * * * *

Di 14 Tabaxê de sê ro û sê şev
Makîne girgirê danîn li ser gundan tev
Ji Mastan, mala Gedîkan
Ji Akkilîsê mala Bilo
Ji Keman mala Hesê Şekir
Ji Şilkê mala Zayîman

(*) Dersim isyanindan Diyarbakir'a Şükrü Laçin...



www.netewe.com

Ji mixundiyê
Ji Velan
Ji Paxê
Û hîn
Gundên din
Kevir li ser kevir nehiştin
Heywan, dar û ber
Jin û mêr tev kuştin
Hemû gund talan kirin birin...

## BÛYERA ELÎŞÊR

Zarîfe û Elîşêr
Jin û mêr
Herdu yên nemir
Bi can û dil û mezbût
Germ û mirovhez
Bi cangorî û patî
Mirovên bîhnpakî
Ji bo felatiya Dêrsimê
Û serxwebûna Kurdistanê
Dest dabûn hev û digotin
" Şuxulê welatparêziyê nabe rev
Êşkence, mirin û nêrzbûn ne tu tişte tev "
Tê gotin
Elîşêr û Seyîd Rizo hatin ba hev
Û wisan got Elîşêr
" Emê ji halê êlî
Derbazî halê dewletê bibin
Dewleta kurd sazuman bikin "
Sey Rizo bi vê axaftinê
Gelek dilîn dibe
Ji ciyê runiştî radibe
Axaftina xwe wisan dom dike
" Lewra emê bi yekitiya xwe



www.netewe.com

Dema ku şanîdanê serhildanê çêbe
Ji bo şerê çekdariyê sond bixwun
Sond bixwun û ji avê Munzurî rûmet
Lepekî tijî vexwun !"
Û li ber tavê
Vexwarin kulmek ji avê
Û sond xwarin wê gavê
Ser soz û sond û paymana xwe man
Dema ku hat şehadeta ewan
Tu carî poşman nebûn û negotin ` eman! '
Doza xwe parastin
Li ber xwe dan
Bi pîrozî can dan !

* * * * * *

Girt Elîşêr
" Ordiyên Kurdistanê
Qehiranin wahş û hov
Em ê bona welat bimirin
Naxwazin ew moxolên hov
Dilo yeman
Çiyan girt berf û dûman
Ji me re bişînin şahî merdan
Ew dermanê hemû derdan...

* * * * * *

Çi xweş mirov e
Nurî Dêrsimî
Û Şîrove
Wî li ser Dêrsimê
Welatparêzekî hemdem e
Dersdarekî mîna wî kêm e !
Seyîd Riza
Elîşêr



www.netewe.com

Û Nurî Dêrsîmî
Ew in mînak
Ji bo felatiya me
Ew in derewşê têkoşîna me

## BÛYERA ŞAHÎN BEGÊ Û SEY HUSÊN

Ew berxwedan
Ew daweta netewî
Ew îdîya pîroz
Ew sitran şîndar e

Bê tore û hovên dinê
Celal Bayar û Abdullah Paşa
" Bi rêve here...
Rojekê çerxa we jî bişikê
Bawermendê we paşa yeke
Ew jî helweşe..."

Tê gotin
Şahîn Beg
Roja ku hate girtin
Hemu mêr û jin civandin hev
Birin li ser girê Mêzgirê tev
Dan li ber makîna girgirê
Fadîme Xatunê got li wê derê
" Zû me bikûjin, bila zaro
Neyên veceniqandinê "
Û ber derba mirinê
Got û got Şahîn Begê
" Mezin û biçukên Dêrsimê kuştin
Dilşikestî ji me re hîştin"



www.netewe.com

* * * * * *

Girt Sey Husên
" Ax ! welatê min çi şirîn
Dil bi keser bi qêrîn
Destê min jê nabe
Him alîyê jor, him li ya jêrîn
Silav li we têrên ku
Ser lat û zinaran dihêwirin
Xwe dane paş keviran
Ve şartî û newêrin
Êstirên çavan di barînin
Û li min nanêrin in

Îro em hemû bi pev re
Dil û bende kirin bi hev re
Ji hebûna me ditirsin
Lewma ji me dipirsin
" Şertên îslamê "
Bi rêya olî
Bêbextî, bi êşkence û hovî
Didin tobe kirin
Ku serê me bibirin
Çawa bikim
" Perawî zilmê
Kêm hatiye tirxan kirin "
Tofan ser me ve hat
Der û dor bû şewat
Tarî û mixurbe bû
Ronahiya avê xewde çû
Tari ye û guregura ewran e
Şeq şeqa bruskê û dewran e
Xwîn ji dilê min tê
Ew baranê herdu çavan e



www.netewe.com

## BÛYERA SÊ MÊRXAS Û NEH GENERALAN

Wek tê gotin
" Sê mêr "
" Sê mêrên mêrxas "
" Sê bira " hebûn
Dizanim ewqas
Her sisê asê bûn

Şiyar bûn
Ji xewa giran
Bi nav û deng
Wek peyagiran

Dema Gaxendê bû
Her sisê hatin girtin û
Tifingên wan ji destê wan çû
Zincîr histuyê wan xistin
Bi hev re girêdan birin
Dixwestin, serê wan bibirin
Neh general benda wan bûn
Bo vê girtinê ew şa bûn
Dema ku ew pêşber bûn
Dîl û bende û girêdayî
General ji ciyê xwe rabûn
Leşkeran got :
" Êra, ew in beredayî "
Dîsa ji, ji wan ditirsiyan
Bi tirs yek û yek
Ji wan pirsiyan
" Ma, te çiqas leşker kuşt ? "
Yekî ji siseyan bersîv da
" Heya ku çavên min dî
Û tiliya minî nîşandekê lepitî
Min lêda û lê reşand



www.netewe.com

Wê demê leşkeran piştve daşand
Û ew kontax kirin
Serê wan xar
Pişta wan bul kirin
Û pêy hev pirs lêkirin
" Çawa ?"
Sisê biran bi hev re
Û giran bi giran
Ji navranê xwe de çardexar derxistin
Ser neh generalan de lax kirin
Û lêxistin
Laşê wan ji erdê ve raxistin
Û gotin
" Êra, hanê..."

## BÛYERA QEMERÊ SOR

Qemerê sor şerkerekî xîret e
Heya guleyê dawiyê berxwe dide
Û lê tê girtin hawirdor
Wê demê "ez teslîm " dibê
Bila leşker neyê
Serleşkerek bê
Serleşker bi leşkerekî diçe
Ku dest û piyên wî bipêçe
Berê tifingê rastgirî
Serleşker xwezî ji dest bigirî
Ji tifinga qemer agir dibarî
Serleşkerek û leşkerek dimirî
Qemer berê xwe digorî
Zinerên asê û bê dawî dinêrî
Dibê " Yadê ez hatim " bi kela girî
Xwe ser jêr davê û diqêrî
" Ez neketim destê we
Min ew kêf neda we



www.netewe.com

Tola xwe girt bi destê xwe
Ez gihiştim mebestê xwe... "

**BÛYERA REHBERÊ XAYÎN**

Rehber ew e
Kurmê darê ye
" Kurm ji darê nebe
Dar hişk nabe "
Wî bextê xwe xira kir
Tifing li ser Elîşêr lax kir
Rehberê xayîn
Ji bo wî çê nebû mayîn
Romîyan bona xatirê
Soz û paymane dayîn
Akamê wî jî kirin tayîn
Û gotin wî " çaqalê xayîn "
" Ewi ku ji gelê xwe re neyar
Tu kesê re nabe yar "
Ew diraw û zêrên ku dabûn yekcar
Danîn ser hustiyê wî wek bar
Hefsarê wî kişandin ew birin
Bi êşkence û tade serî jê kirin

* * * * * *

Jin
Zaro
Û mêr
Rêz kirin
Li bindîwaran
Ew zor û zilm nedîtîbûn tu caran
Bes baş dizaniyan ku
Qurşun tesîr nake sitranan
Sitran li ser ewan tê gotin



www.netewe.com

Mîrov dilînî dibe, dil bi sotin...
" Malan bar kir
Çûne waran
Goştê me xwar
Mişk û maran..."

* * * * * *

Kûz şikest
Av rijiya
Ji Zazayên Palû
Û bezirganên Amed
Çek û rext dihat
Dêrsîmiyan dikirî
Ewan difirot !...
......êrîş dikirin ser qereqolan
Jê sitandin mitralyoz û makînê giran
Nedizanîn bi kar bînin wan
Û nediqetandin têlên telefonan !
Bi sitran, bi qêrîn û bi xwîn
Têkve birin zora qurşûnan
Ew jan, ew êş ew hesretê han
Mina agirê helandî herikî çu ket dilan
Dil birindar
Dil bi xwin
Dil şikest ewan salan
Lewra
Ji were pêşkêş bikim
Bûyera du biran
Du bira sond xwarin
Bi hev re
Bona rojên giran
Teng û tarî
Wê gavê
Li ser tavê



www.netewe.com

Li ser avê
Li ser hewayê
Ji bo doz û davayê
Gotin:
" Me sond xwariye
Peyman daye
Emê îro hemû yek bin "
Du bira
Êriş kirin li ser
Rawestin li ber
Bi darê zorê
Lêv û pozê dijmin anîn der...
Du bira
Mina Rizo û Elîşêr
Du têr
Yek baz e
Yek şêr
Du mêr
Di dest de kêr
Bivir û bêr
Derketin çiyan
Û gotin
" Em mîna tiliyên destan
Bi hev re girêdayî ne
Yek tilî jan bide
Êdî ew jan bikeve
Dilê me hemûyan..."

## BÛYERA KEŞE Û LEGLEGÊ

Di gundê Karê
Torinê Bilo
Û lawê Awês Husnî
Bi kela girî
Dil bi keser



www.netewe.com

Go û got
" Wê demê ez zaro bûm
Me xwe spart deviyê
An Jî kort û çalan
Tazî, tî û birçî
Heya çend salan
Bawer im eşîra me jî
Tê hesibandin
Milek ji eşira Îzolan
Bav û kalên min
Derengî bûbûn dijraber
Piştve çar demsal buharîn
Disa dom dikir şer
Em zaro man
Wek bêbask û per
Rojekê gotin
" Va ye hatin leşker "
Me bi kevir dar û ber
Êriş bir ser
Û ji ber me reviyen
Ew leşker
............
Xalê Husnî got
" Meselek heye "
"Yên ku dixwazin tê bigîhin
Ji bo wan wiz wiza mêşan tembur e
Yên ku naxwazin bibêhin
Ji bo wan jî dahol û zirne nabuhure ! "
Dixwazim bûyera leglegê bêjim lewra
" Dema berê
Keşeyekî
Filehan hebû
Li kela Karê
Cîwar bûbû
Tê gotin



www.netewe.com

Ew keşeyekî pir zana û jir e
Çend seyîdên xirab dixwazin
Felekê çêkin ji wî re
Dicivin, diçin pêşber
Bi fêl fendên xwe her
Jê dipirsin
" Ya! Keşe
Weku tu zana yî
Û ji te bê
Ma tu dikarî bêjî
Legleg kîjan rojê tê ?"
Keşe raman dike û bersîv dide
" Riwayet ew e ku
Leglegê bi xwe gotiye
` Ez heyştê adarê nayêm
Nehê adarê ji nabuhurînim ' "
Rojekê
Heyştê adarê û şev
Xew nakeve çavên seyîdan lê,
Û legleg tê ser baceyê malê
Wê dixin dafê
Digirin û heps dikin...

Leglegê gelek caran xem û êşa welatan dîtiye
Dil bi kul e û rêyê dûr û dirêj hatiye
Legleg, legleg bûye ew xirabî nedîtiye
Û wisan gotiye :
" Me xwedêyo ! va seyîd çi kutî ye
Mebest xirab û rispiyeke kal e
Ne wek min bêkes jar û bêhal e
Çi bikim ew mirove û şirê xav mîtiye "
Seyîd çend roj wirde diçin li gel Keşe
Û ji wî re dikin serewde
Dibêjin
" Ma tu ji Xwedê natirsî



www.netewe.com

Şerm nakî ji avda
Hanî legleg bihata..."
Keşe dibêje
" Legleg hatiye
Bûyerek bûye
An girtiye
En jî girêdayî ye "

Wê gawê
Seidek fedî dike
Wisan dibê

" Gotinên te rast e lê...
Min bi çavên xwe dit vê sibê
Legleg girêdayiye çawa bê ! "
Û diçin lê dinêrin ku hê
Legleg di hewşê de girêdayiye
Û jineka di hewşê de
Agirekî pêt û har vêxistiye û dadaye
Vê demê, ji nişka ve
Esûmanên bê nûk û bê dawî de
Leglegekî din perên xwe perpitînî
Û tê li hêwirî li ser baceyê xanî
Dema ku leglega girtî wê dibînî
Ji dil bi keser bi dengekî xawînî
Mirinê de azad
Ji bo mirinê azad
Û xwe li ser serî
Dixe nav agir...
Tê gotin, riwayet wisan çêbûye
Ew keşe pirî fanî ye
Gaveke wî li vê dinê ye
Gaveke wî ji wê dinê ye
Û ew hesreta dema xwe de mirinê ye
Rojekê mirovên havîrdorê xwe re dibêje



www.netewe.com

" Ezê sibê bimirim
Bila laşê min ji we re bar nebe
Daynin bin dara gûzê
Gurek bê û min bi xwe re bibe "
Ew xwestek çêdibe
Keşe diçe heqiya xwe
Laşê wî daynin bin dara gûzê
Û gurek tê û wî bi xwe re dibe...!

## GEŞ BİBE DÊRSİMA MİN

Geş bibe Dêrsîma min
Geş bibe
Dildiziya min ji te ma
Riwayet dibe ku
Mêrxas
U bi namus e kirîvcan
Destê xwe
U pişta xwe -canparêz e-
Pê dikarî
Li ser axê ku hê hisyar nebûye
Li ber tavê tê qelînê
Mina heykelekî mîsîzer
Ew laşên şewitî
Tazî
Birçî
U tî
Belam
Ferad, Dicle, Zap û Çemê Sor
Çiyayên Toros, Cudî, Agirî û Munzur
Titun, Genim û pembû
Sêv, hirmî, tirî û gûz
Hemû daristan, fêkî û xamcewher



www.netewe.com

Di bin dorpiyê Mêtingehkaran de ye
Geş bibe Kurdistana min
Geş bibe
Dildiziya min ji te ma
Wek metranê agirber
Di kezebê min de
Ew gundên bê rê
Nexweşên bê derman
Ew tev kujtin
Zor û zilm
Qêrin eman
Û mirovên belengaz
Koçewar, tî û birçî
Riwayet dibe ku
Mêrxas bi namûs e
Kirîvcan
" Destê xwe
Zimanê xwe
Û pişta xwe
Pê dikarî "
Belam
Tu nebê, çiqas zimanê xwe nû kirine
Misliman ên kevneperest ên Quranê
Bi xwinê tê şuştinê kuçeyên Lubnanê
Û li Tirkiyê diayek nayê xwendinê
Li ser mirî û meyîtên Elewiyan
Nizanim kuve - kude dest pê bikim
Ma, çava bêjim, çava bikim ?
Esil,
Ji bo têgihiştina zimanê pevçûnê
Û rêzimana ling kişandinê
Ango,
Dinyayekî materyalîst
Bi navê xwedîyên
Aşitî û azadiyê



www.netewe.com

Nefî û pevçûnê
Ew sitranek e
Ji bo fêkiyên teze
Pembûyê spî
Genimê serî zêr
Û biratiyê
Rîwayet dibe ku
Mêrxas
Û bi namus e
Kîrîvcan
" Destê xwe
Zimanê xwe
Û pişta xwe
Pê dikarî "
Mixabin
Kirîvê min bê bask û per e
Bona ew bîhnpakiyan
Dixwaze bifire here
Bê hêvî ye
Ma, hêvî çi ye ?
Miqabilî hêvîdariyê jî
Dijraber bûye
Di wan çol û çiyan de
Evînî têkve çûye
Hesret ne bi hêsanî
Çûyin û hatina bajaran bûye
Ma, çi hesret !
Gelo kê ji te sitand ew hêvî ?
Ji bona çi tû xeyîdî ?
Kê birîndar kir evîna te gîdî ?
Ax ! û ax !
Of û of !
Wisa dil bi keser neşevitiye Kerem
Êdî çiya ne di bin evîna Ferad de ne
Ew Qereceoğlan jî kî ye ?



www.netewe.com

Rîwayet dibe ku
Mêrxas
Û bi namus e
Kirîvcan
" Destê xwe
Zimanê xwe
Û pişta xwe
Pê dikarî "
* * * * * *
4 Nisan 1989
Ez girtî me
Li derve buher e
Zendên min bi zincîr in
Laşê min hatiye daleqandin
Û ez bi êşên dilê xwe Mehabat im
Sitranek li ser zimanê min ji Palo
Di destê min de gula Dêrsimê
Diçim serhildanan lo !
Min dît têkve çû têkoşerek
Min dît jinên Palo wek dijraberek
Destên xwe dewisandin li ser birînên xwe
Bi xwina sor di bû tilîyên xwe
Û bilind dikirin dengê xwe
" Ya Niştimana azad, yan mirin "
Di buharê de mirin
Zor e gula min
Em çawa bi hêsanî herin
Û Min Jî êşên dilê xwe
Li sitranan bar kirin
" Ay, ay li min
Di Dêrsimê û Helepçê
Hatin Qelandin zav û zêç
Ay, ay li min ! "
Ax !Sitran li ser me tên gotin
Ew hesret di dilê me de bûya sotin...



www.netewe.com

**ÇAVKANÎ**

Di sala 1987 ê, demsala zivistan û buharê de ez çûm Dêrsimê û min li gelek gundan lêger û lêkolîn çekirin. Ji bo vê alîkariya bi rumet û giranbûha; Hemê Dêrsimî, Mixtar Adil, Mamoste Ismail, Xidî Porê, Dirsî Koçgîrî, Senemxan, { kek Îdrîs - Sebrî }, Torinê, Qîyayê Awêsî Bilo, lawê Awês Husni, Kurê Xidî Nam Îsê û welatparêzên din re bi minet û sipasdar im.

Wekî di, min ji hinek bûyer û pirtukên; Ş. Laçin { Dersim Isyanindan Diyarbakir'a ... 1992 }, F. Bulut { Belgelerle Dersim Raporlari, Sun yay. 92 }Nurî Dêrsîmî, { Kürdistan Tarihinde Dersim, Dilan yay. 92 û Hatiratim, Özge yay. 92 } Barbaros Baykara { Dersim 1938 Akar yay. 82...} Ji ewan hemûyan bê destûr feyde dît...

- Ji bo amadekirina vê destanê ji alîyê ziman û rêziman de romannivîs, dostê hêja û xweşik Mehmed Uzun arîkar bû rexne û pêşnîyarên durust û çêker lê kir. Min jî careke din Hevl da xwe û ji aliye uslib û li hevanînê hinek ji pêvistiya wan kêmasiyan anî cih. Bi can û dil, giram û evîniya xwe pêşkêşî wî dikim

- Ji bona arîkariyên Lütfî Baksî û Munevver Malgir gelek spas dikim.

- Dîsa birayê hêja M. Emîn Narozî li ser rêziman û rastnivî - sandina vê destanê kedkarî kirîye û xwe êşandiye, Ew rexne û pêşniyarên wî min girtin ber çavan û carake din nû ve helsengînin û nivîsandin...

**A.D.**



www.netewe.com

**SERPÊHATÎ**

Adil Duran 1955, li Kurdistana bakur ji Dêrsimê ye. 1968 an de bi karê şano dest bi jîyana hunerî kiriye. Piştre bi rojnamevanî û helbesnivîsiyê jîyana xwe berdewam kirîye. 1971 de cara yekem ew tê girtin. 1978 an ji ber sedema zor û zilma romî tê Berlînê, dizewice û li wir cîwar dibe.Li Tirkîyê di gelek kovar û rojnameyên çep de berhemên wî tên weşandin. Disa di derveyî welat de ji nivîs, xêzik û helbestên wî di kowar û rojname yên biyanî û kurdî de cî digirin. 1984 li gel hunermend û ronakbirên kurd; " Nawenda Çanda Amojgarîya Kurdî " sazuman dikin û ew dibe berpirsiyarê karê çandî...
Adil Duran di warê helbestan de sala 1976 an li Tirkiyê xelata yekem distîne.
Di karê xêzikan de, sala 1977 an xelateke taybetî, sala 1979 an de jî li Kubayê xelateke mezin ya navnetewî ( Xelata Xawênê ) distîne.
Vêne û xêzikên wî 1976 di festîvalaYarimcayê ya navna - tawî de tên rexistin. 1984 / 85 an ji li Berlinê du caran xêzikên wî têne raxistinê. Adar 1993 an ji wêneyên boyaxa bi nift li Baselê galerî Cautika de / Pirtukxana Gelterkindenê de û bi arikariya Organizasyonên mirovhez pêşanidaneke mezin ji li B.A.S ê radixe....

Adil Duran 1985 an de çû Swêd û sê salan li wir ma. Piştre jî sedemê pêwistiya kar û barên siyasî bi rêç û şopên rêx - istinî, berê xwe da welat ( dawîya 1987 ) 4 Nisan1989 ' ê da hate girtin. Ew sê salan di girtîgehên romî de ma... Careke din 1992 an de ew derket derve, nefiyê jîyana mihacirîyê bû...

Weşanên Çanda Nûjen — ISBN - 91-972247-4- X

www.netewe.com